# Agahdarî ji sûriyan re

Ji ber rewşa nezelal ya li Sûriyê, em neçarin çareserkirina serlêdanên (telebên) penaberiyê yên Sûriyan rawestînin heya ku rewşa welêt zelaltir bibe.

Em dizanin ku ev demeke dirêj e gelek ji we li benda bersiva me ne, û em gelek xemgîn in ku vê biryarê hiştiye ku libendêmayina we a bersivê hîn zehmettir bibe.

## Çima UDI çareserkirina serlêdana penaberiya min rawestandiye?

Dema ku em dinirxînin ka ji mafê te ye ku tu mafê penaberiyê li Norwêcê bistînî yan na, em dinêrin ka çi xeter wê di pêşeroje de liser te hebe: Gelo tê werî çewsandin li Sûriye eger tu vegerî wir? Ma rewşa ewlehiyê ya li Sûriyê ewqas xeter e ku em nikarin te bi paş de bişînin?

Ji ber ku rewşa Sûriyê ne diyar e, derfeta me tune ku em binirxînin ka dê çiqasî ji te re xeter be eger tu vegerî wir. Ji ber vê yekê, lazim e ku em çareserkirina doza te rawestînin heya ku em bêtir bizanin.

## Çima UDI hevpeyivînan bi penaberên sûrî re nake?

Di hevpeyvîna penaberiyê de, em agahdariyên herî girîng digirin ku ji me re hewce ne ji boyî nirxandina serlêdana parastinê a te. Wê hingê girîng e ku em baş bizanin çima tu bawer dikî ku tu nekarî biçî welatê xwe. Ji ber ku dema hazir rewş ne zelal û diyar e, em nikarin bi asihî bizanin ka em ê karibin ser wan hemî mijaran re ku wê ji doza te re girîng bin, derbas bibin.

Tiştê ku hiştiye UDI çareserkirina serlêdanên penaberiyê ji Sûriyê rawestîne, nezelalbûna rewşa ewlehiyê ye di dema pêş de.

## Kengî UDI dikare dest bi çareserkirina daxwazên penaberiyê bike?

Mixabin, em nizanin ka wê çiqasî dirêj bike, berî ku em careke din dest bi çareserkrina serlêdanên ji Sûriyê bikin. Ev bi rewşa Sûriyê ve girêdayî ye. Em ê di derheqê vê yekê de bêtir agahdariyan bidin we.

## Doza min ketiye ber peymana Dublinê. Ma gelo çareserkirina doza min dê were rawestandin?

Na, emê berdewam bikin û dozên Dublinê çareserbikin bikin. Lê eger ji te re were gotin ku doza te dê li Norwêcê were çareserkirin, hingî wê çareserkirina doza te were rawestandin heya ku em baştir li ser rewşa Sûriyê serwext bibin.

## Gelo serlêdanên ji Sûriyê tên çareserkirin li welatên din ên Ewropî?

Pirraniya mezin a welatên din ên Ewropî jî çareserkrina dozên penaberiyê rawestandine. Pêwîstiya wan bi heman agahdariyan heye ku em li Norwêcê hewceyî wan in, berî ku ew bikarin serlêdanên penaberiyê çareserbikin.

## Ma ez dikarim destûrnameya xebatkirinê a demkî bistînim di dema libendêmayina bersivê de?

Ji boyî ku mafê te hebe tu daxwaza wergirtina destûra xebatkirinê (şixul) a demkî bikî, divê tu çûbê hevpeyivîna penaberiyê. Her weha divê te pasaporta xwe radest kiribe, û divê wextê pasaporta te ne qediya bê di dema serlêdana parastinê de.

Eger tu ne çûbê hevpeyivîna penaberiyê, emê nekaribin serlêdana te ji bo wergirtina destûra xebatkirinê çareser bikin.

Berî niha, şertê çûyina hevpeyvînê liser sûriyan ne dihat ferzkirin, ji ber ku piraniya penaberên Sûrî mafê rûniştinê distandin. Lê ji ber ku rewş niha ne zelal e, em niha serlêdanên sûriyan ji bo standina destûra xebatkirinê a demkî çaresernakin. Em û Wezareta Dadê û Ewlehiya Giştî lêdikolin ka emê bikaribin destûra xebatkirinê a demkî bidin Sûriyên ku hevpeyivîn bi wan re nehatiye kirin. Lê heya ku em bersivekê liser vê yekê nestînin, emê nekaribin serlêdanên wergirtina destûra xebatkirinê a demkî ji bo kesên ku ne çûne hevpeyivîna penaberiyê çareserbikin. Em ê di derheqê vê yekê de bêtir agahdariyan belav bikin.

## Ma imkan heye ku min vegerînin Sûriyê bêyî ku li doza min were nêrîn?

Na, ev tişt nikare bibe. Ger te daxwaza parastinê li Norwêcê kiribe, mafê te heye ku doza te bi kûrahî lê were nêrîn. Wê bi heman rengî wekî penaxwazên din, bi kûrahî li doza te were nêrîn.